

folklorame

Zargotin pişt e, folklor her tişt e!

Hejmara 9. | Adar • Nîsan • Gulan 2021

Rêwresmî Zemawendî Pîrî Şalyar, Lokman Rehîmî
Ehmed û mahr, Hikmet Yildiz
Beytên sedsalyên navîn, Nûrê Cewarî
Tembelê Bexdayê, Jîyan Ozkan
Behlûl û meselokên wî li Herêma Torê, Elif Gun
Beyta Feqe û Xecê, Yûsif Hêşetî
Rostemê Zal û Selmanê Sindî, Vildan Sevîm
Rûvês, Ayela Zarto



SELAHADDİNÎ EYYÛBÎ
CAMIÎ 1185

BU GÜN
ALLAH İÇİN
NE YAPTIŒ
H.Z. ÖMER
R. A.

TEMİZLİK
İMANDANDIR
H.Z. MUHAMMED
S. A. V.

Mûrat Adiyaman

ISSN 26676443



9 772667 644002

Dengbêj Ebdulkerîmê
Zayteyî




Mamo Burhan

Ebdulkerîmê Zayteyî sala 1963ê li gundê Zayteyê hatiye dinyayê. Ew li ber destê bavê xwe, Hacê Silêman fêrî gotina stran û awazan bûye. Nîfşê sisêyan e ku dengbêjî/stranbêjîyê dike. Piştî valakirina gundan li taxa Kanî Kewkê, li Colemêrgê bi cih bûye. Xwedî bireke kûr e. Stranên kevn li ser selîqeya Tixûbyanî adapte dike û dibêje. Jîyana xwe ya rojane li ser stranên ava kirîye û gelek hez ji stran û dengbêjîyê dike. Ji civat û dîwana wî muzikhez kêr nabin.

folklorame

Hecî Ce'fer (1951-)



Hin berhemên folklornas Hecî Ce'ferî

1. Gotnêt mezinan li Devera Behdînan, Bexda, 1986.
2. Stiranêt dawet û govendêt kurdan, Bexda, 1986.
3. Stiranêt severoka, Bexda, 1987.
4. Heyranok ji kelepûrê kurdî, bergê êkê, Hewlêr, 1989.
5. Hindek kevnebawerêt xelkî li Devera Behdînan, Bexda, 1993.
6. Stiran û yaryêt biçûkan, Silêmanî, 2006.
7. Pejî û gotinêt kurdî, Duhok, 2006.
8. Qeftoka stiranêt folklorî, Hewlêr, 2007.
9. Carekê ji cara (çîrok bo zaroka), Silêmanî, 2007.
10. Heyranok ji kelepûrê kurdî, bergê dûyê, Duhok, 2007.

folklorame



 Aydin Batur

folklorame



SPAS JI BO
ALÎKARÎYA WAN

Aydin Batur
Bîrgun Uzûm
DÎHA
Dûrzan Cîrano
Evdirehman Gok
Ferhat Arslan
Îskan Altin
Jîyan Ozkan
Lokman Rehîmî
Mamo Burhan
Mazlûm Sîyabend
Mûrat Adiyaman
Qedrî Esmer
Refik Tekîn
Tehsîn Baravî



Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 3

Hejmar: 9

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpîrsa Nivîsan: Gevrîye Atli

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksîyon: Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

ISSN: 2667-6443

Grafik: Sevînç Adiyaman

Fotoyê bergê pêş: Lokman Rehîmî

Fotoyê bergê paş: Mûrat Adiyaman

Navnîşan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađluk ve Kùltùr Vakfı

İktisadi İřletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

Sertifika No: 42382

Çapxane: Aliođlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kađ. San. Tic. Ltd. Őti.

Orta Mah.Fatin Rùřtù Sk. No: 1-3/A Bayrampařa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59


Sertifika No: 16919

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com ✉


folklorame 🐦 📷 📺 📶

Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsiyar e.



Kitabo Pêşnîyazkerde

Nameyê Kitabî: Dêvo Kor
 (Estanikanê Gimgimî ra)
 Arêkerdax: Huseyîn Ballikaya
 Weşanxane: Weşanxaneyê Vateyî



Naverok

- 5 Ji edîtorî
- 6 Xewre, **Zîya Mukrîyanî**
- 8 Jimartok û lihevanînokên Devera Qelqelîyê, **Mehmet Yildirimçakar**
- 11 Efsaneyaya Mem Şivanê Mîrê Mirazan, **Zeynep Yaş**
- 14 Rêwresmî Zemawendî Pîrî Şalyar, **Lokman Rehîmî**
- 18 Ehmed û mahr, **Hikmet Yildiz**
- 26 Li gor teorîya etnosebolîzmê Destana Kawayê Hesinkar, **Bawer Erîşen**
- 32 Bawerîyên gelêrî yên Agirîyê, **Fatma Şahîn**
- 37 Beytên sedsalyên navîn, **Nûrê Cewarî**
- 42 Her kes û şîrê xwe, **Kurdjan Sorî**
- 55 Hemîs, **Şehrîban Matyar**
- 57 Mamikên Berîya Mêrdînê, **Mihemedê Pîrê**
- 61 Tembelê Bexdayê, **Jîyan Ozkan**
- 67 Jîn û berhemên folklornas Hecî Ce'fer, **Cemîl Şêlazî**
- 70 Nexweşî, dermanên nexweşîyan û awayên dermankirinê yên berê li Qerejdaxê, **Mehpûs Serhedî**
- 77 Behlûl û meselokên wî li Herêma Torê, **Elif Gun**
- 79 Xaçepirsa folklorê, **Oktay Altûn**
- 80 Yomsiz Yomsiz i, **Hatîce Aktay-Helbest Çetîn**
- 81 Beyta Feqe û Xecê, **Yûsif Hêşetî**
- 85 Danasîna pirtûka “Lîstikên Biçûk û Mezinan Li Deşta Mêrdînê”, **Alan Pîrê**
- 90 Rostemê Zal û Selmanê Sindî, **Vîldan Sevîm**
- 99 Lihevanînokek ji Geverê, **Rojbîn Tekîn**
- 100 Rûvês, **Ayela Zarto**
- 106 Kilama Şerê Sêkanîya, **Elîf Gunduz**

Ji edîtorî

Mizgînîya me li we, şîrîna ber dilê we Folklorî Me çap bû. Hejmara 9ê li me hemûyan pîroz be. Folklorî Me ket sêsalîya xwe. Ev sê sedsal in (1711) ku keresteyên folklorî kurdî tîn berhevkerin. Folklorî Me jî hewl dide ku bibe navgîna parastin, belavkerin û vejandina folklorî kurdî. Hejmara 9ê mîna kulîlkeka biharîn zîl da, geş bû, xwe xemiland û li benda we xwînerên hêja ye.

Hejmara 9ê bi xwarina ‘Xewre’yê dest pê dike û bi kilameka Pasûrê bi dawî dibe. Dîsa nivîsên ji beşên curbicur yê folklorê di kovarê da cihê xwe girtine. Di vê hejmarê da lêkolê Cemîl Şêlazî bi karekî giring rabûye, jînameya lêkolê û berhevkar Hecî Ce’ferî amade kirîye û lîsteya tekûz ya berhemên wî daye. Li gorî me, divê kurd bêtir qîmetê bidin xemurên çand û kelepura xwe. Divê wexta ew li heyatê ne, em qîmetê bidin van lêkolê û hêjayan da ew jî hest bikin ku xelk qîmeta karê wan dizane. Û bi vî awayî em wan nas bikin û ew jî li karê xwe sor bibin. Berhevkar Mehpûs Serhedîyî, dîsa konê xwe li Qerej-daxê danîye û ew bi rêbazeka cuda behisa xaleka taybet ya folklorî kurdan dike. Serhedî berê xwe daye hekîmîya gelêrî.

Kurdîstana me welatekî kevna e ku rehên wê xwe qewî bera erdê dane. Her reheka wê gencîneyek e ku tijî ye bi destan û efsane û xeberêş û stranên. Berhevkar û lêkolê folklorî kurdî li gund û bajaran digerin, ji qunc û goşeyên jibîrkirî van gencîneyan didin hev. Berhevkar Kurdjan Sorî, Hikmet Yildiz, Jîyan Ozkan û Vîldan Sevîmê jî herêmên xwe xeberêşkên balkêş berhev kirine ku mirov ji xwendin û guhdarkirina wan tîr nabe. Her yek bi devokeka cuda, peyv û qalibên cuda, şîret û hikmetê di wan da veşartî; mirov heyîrî dimîne. Ayela Zartoyê wekî her car li ser riwekên Kurdîstanê nivîsîye ku îcar jî riweka ku qal kirîye heyranên wê pir in û wext jî tam ew wext e ku hûn herin berhev bikin û bixwin.

Li gel van nivîs û nivîskarên navborî hin berhevkar û lêkolêrên nû jî hatine civata me, em li ser navê xwe û we xwîneran xêrxatinê didin wan û serkeftinê ji wan ra dixwazin. Lokman Rehîmî, Mihemedê Pîrê, Alan Pîrê, Rojbîn Tekîn, Nûrê Cewarî û Bawer Erîşen nivîskarên nû yê vê hejmarê ne. Kevir bi kevir bilind dibe qûça me, em spasdar in ku wan jî kevirên destên xwe danîn ser qûça me û qûç bilindtir bû.

Heta hejmareka din bimînin di xêr û xweşî û geşîyê da. Cejna we ya remezanê û cejna zîmanê kurdî pîroz be.

Eşref Keydanî





Zîya Mukrîyanî

Xewre, xwarineka şîrîn û germ e. Çêkirina wê pir hêsan e û bêtir di mehên sar da tê çêkirin. Mirov bi saya dimsa kelandî pê germ dibe. Piştî mahsereyan, di payîza dawîn û zivistanê da pir tê çêkirin. Ji ber ku xwarineka biqewet e, ji bo jinên zêstanî tim tê çêkirin, da ku wan bi ser xwe ve bîne û qewetê bide wan.

Xewre, bi piranî di taştê da tê çêkirin û xwarin, lê ya/ê ku bixwaze dikare di firavîne da jî çêke û bixwe. Carnan jê di şûna firavîne da ji gavan û şivanan ra tê çêkirin û dikeve bedêla xwarinê. Xewre, wekî helasudlo (tilî şewitî), helawîya sor, şilikî, hacka hecacan (hacka mirîyan), kutilka dimsê, rehê kundiran û kilorîkan ew jî ji dimsê çêdibe.

Xewre

Xewre, xwarineka şîrîn û germ e. Çêkirina wê pir hêsan e û bêtir di mehên sar da tê çêkirin. Mirov bi saya dimsa kelandî pê germ dibe. Piştî mahsereyan, di payîza dawîn û zivistanê da pir tê çêkirin.





Tiştên ku dikevin nava xewreyê û xewre pê tê çêkirin

(ji bo 2 kesan)

- Hêk: 3 heb
- Arvan: Kevçiyekî xwarinê (bila kevçî zaf ne tijî be)
- Rûn: Bi qasî ku binê miqilkê bê şil-kirin (ku nivîşk be, tama wê xweştir dibe)
- Dims: Bi qasî îskaneka çayê (her kes li gorî dilê xwe dikare dimsê zêdetir yan jî kêmtir bera ser bide)



Çêkirina xewreyê

Pêşiyê hêk di sahnîyeka kûr da tê çeliqandin, paşê arvan tê tevlîkirin û dîsa heta baş bê lihevaxistin û li hev bigere, baş tê çeliqandin da ku arvan nebe girêk. Paşê rûn di miqilkê da tê qijandin. Piştî ku rûn hat qijandin, hêkên ku li nava arvanî hatine xistin û çeliqandin, mirov bera miqilkê dide. Ew baş li binê miqilkê tê belavkirin. Ku hat famkirin baş sor bûye, li ser alîyê din tê qulipandin. Di ber ra jî xewreya di miqilkê da tê zivirandin, ji ber ku hem xweştir sor dibe û hem jî naşewite. Piştî vê dims lê tê zêdekirin, çawa dims bi kelê bikeve agirê binê miqilkê tê tefandin. Ji bo xewre sar nebe û bi germî bê xwarin mirov bera sahnîyeka din nede, di miqilkê da bixwe baştir e.

Amadekar: Zîya Mukrîyanî

Zarbêj: Weso Kiliç

Temen: 57

Perwerde: Nexwende

Herêm: Gundê Tizyanê/Artûklû/Mêrdîn



Jimartok û lihevanînokên* Devera Qelqelîyê

Mehmet Yildirimçakar^(*)



a) Jimartok

1.
hêklo mêklo
çar im çêklo
hestyê kewê
wê'l ber cewê
kewka firrî
mamkê gurrî
heban dirrî
pirrrr ser serê *Avzemê* da
birrî.

2.
hêklo mêklo
çar im çêklo
biska Xemê
ara fingê
pê qulingê
hate vîya
dani vîîya

3.
heleq meleq
dindkê leqleq
kîso kember
ya Pêxember
vîna derket
kete vî.

4.
heleq meleq
dindkê leqleq
kîso kember
ya Pêxember
dindkê sor e
xav e lor e
vîna derket
kete vî

(*) Li herêmê ji van cure gotinan ra "meselok" tê gotin.

(**) Xwendekarê doktorayê, li Zanîngeha Çewlîgê (Bîngol), Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî.

5.
êkan e¹
dabiskan e
xana çepê
çepil mizê
ara gîzê
tote hînê
serkêşînê
hilkêşînê

6.
hêkê mêkê
çamûr çêkê
ava rûngê
du qulingê
mi'îna² Salo
qûnspîyê
ser serê kê da dirrîyê...

7.
heblan deblan
çîlo çepilan
bisko 'enber
xatûn gozel
perê çûkê
wê'l gêdukê
Mam 'Emero
xwelîsero
here dero

8.
yek û du
bawer sê
çeqla fisê
mamo dîno
kevrê şîno
simbêlboqo

1 Ev jimartok zivistanê li ser tenûrê tê gotin. Kesên hazir lingên xwe dikin tenûrê, gotina dawî li kê bikeve ew lingê xwe hildikêşe.

2 mi'în: mehîn, hespa mê.



 Tehsîn Baravî

çavzer doqo
ar tûtiko
Şêx Geylanî
dev pûtiko

b) Lihevanînok

1.
ha rovî rovî rindiko
ha rovî rovî mamê min
dev kutaye paqa min
rovî hate nav mala
bigirin bidin ber dara
rovîyo devşûjîno
xu gij kir hate mino
dev kuta lingê mino

2.
'Edîle Naşît³ milqol e

3 Lîstikvaneka navdar di sînemaya tirkan da.

gundê me qereqol e
ya 'Îsa ya Mûsa
ketme destê ramûsa
mele bang da
pîrê can da
avsîrka me sar bû
kevçyê me xar bû
golka me mirar bû
dinya xira bû

3.
hopanê hopanê
kezya min e reş e pe'nê
avît gola hanê
gola han qamûş e
me'ra fûşefûş e
navê kekê'm Çawûş e
çawûşê piçûk e
jê ra anî bûk e
bûka qelender e
xayê şala zer e



Efsaneyaya

Mem

Şivanê

Mîrê

Mirazan

Zeyneb Yaş



Serpêhatîya ku me berhev
kiriye jî xwedîyê wê helwêstê ye
ku hebûna wê bi van sê kevirên
hêkanî pîroz maye heta roja îro.
Ev her sê hêk bûne nîşana
hebûna wê ya mayînde û bi
saya vê helwêsta wê ye ku tevî
kevirên xwe bûye perestgeh.

Mîrê mirazan Mem Şivan, bi sê hêkên xwe yê kevirîn nav û deng daye. Sê hêkên ku nîşana hebûnê ne û daxwaza dilê mirovan pêk tînin. Kesên ku dest diavêjin van hêkên kevirîn, bê heta wê keliyê çendîn dîmenên bextewarî û şadiyê li ber çavên wan dineqîşin û dikemilin. Hêviya “Belkî bibe”, vîna mirovekî xurt dike ku birra jî wê rojekê xwestek, ango mirazê wê/î rojekê pêk bê. Belkî jî ji bo kesekî bawerî, xwelêgirtina hêviyekê yan jî ihtimalekê ye. Her perestgeh li ser helwêstekê ava bûye, helwêsteka xweser, ku nîşana hebûna kesî li ser rûyê dinyayê dihêle.

Serpêhatîya ku me berhev kirîye jî xwedîyê wê helwêstê ye ku hebûna wê bi van sê kevirên hêkanî pîroz maye heta roja îro. Ev her sê hêk bûne nîşana hebûna wê ya mayînde û bi saya vê helwêsta wê ye ku tevî kevirên xwe bûye perestgeh. Sê hêkên kevirîn ku gava kesek radihêje, sebir û hedana Mem Şivanê Mîrê Mirazan di ruh û hişê bermiraz da ji nû ve diceribîne.

Serpêhatîya Mem Şivanê Mîrê Mirazan

Zîyareta Mem Şivan¹ zîyareteka li bajarê Sêrtê, li gundê Lêfêyê ku li qerexa Çemê Botanê ye. Tê gotin ku mirovek hebûye bi navê Mem. Memî şivantî dikir li zozanan. Bi awazên bilûra xwe mî û berx li çol û çiyayan digerandin. Mem, bi dengê bilûra xwe, hogirî û henûniya xwe bi nav û deng bû. Dengê bilûra wî, mar jî qulê derdixist û dikir ku mar rabe ser dûvê xwe li dengê bilûra Memî guhdar bike û pê bireqise. Mem dildar bû, dilnazik bû, henûn bû, heta ku mî û mêşên çol û çiyayan jî jê reht nedibûn.

Rojekê mêşineka (mî) wî ji kerîyê pezê wî vediqete û berê xwe dide ber bi berrîyê ve. Wextê Mem li zozên dibîne ku mêşina wî ji kerîyê vediqete radihêje sê heb keviran da ku biavêje pêşîya mêşinê û wê vegerîne, lê dike nake dil nade ku kevirî biavêje pêşîya mêşinê

¹ Hem gund bi xwe hem jî Zîyareta Mem Şivan di bin ava bendavê da maye.

qene kevir lê nekevin. Çiqas dengê xwe lê dike, dike eyteeyt, lava dike, hêrs dibe, diqîre, dike nake mêşin berê xwe nazivirîne û her diçe û Mem jî di pey da. Mêşin sebira Memî dipîve. Ji zozanên bilind tînin heta ber bi qeraxa Çemê Botanê. Êdî heyl û taqeta Memî namîne, rê ji mêşinê ra namîne, li ber qerexa Çemê Botanê dimîne sekinî. Hê her sê kevir di destê Memî da ne û Mem li pey mêşinê ye. Gava wê zêft dike, dike ku kevirêkî lê xe, di navbeyna hêrsa xwe û hezkirina xwe da dikeribe û di cihê xwe da tevî her sê kevirên ku ji zozên heta bi wê derê dabû ber sînga xwe û dil nedabû ku pê li mêşina xwe bide, dibe term. Ev her sê kevir di destê wî da dibin mîna sê hêkan. Wî li ber qerexa Çemê Botanê vedişêrin û her sê kevirên di destên wî da jî datînin ser tirba wî.

Ji wê rojê û heta vê gavê, her kesê ku xwezîya mirazê xwe dike û dixwaze ku mexseda dilê wan pêk bê, diçin ser gora Mem Şivanî, bazgurî² Xweda dibin û xwezîya xwe dikin, wan her sê kevirên hêkanî yê ser tirba Mem Şivanî datînin ser hev. Heke kevirên hêkanî li ser hev bisekinîn ma nexwe mexseda dilê wan pêk bê, wê hêza sebir û semaxa hezkirina dilê Mem Şivanî ya li vê dinyayê mayî wê li wan wer bibe. Bi vê henûniya hezkirinê wê bi hêz, sebir, semax bibin ku mexseda wan pêk bê.

Alimên deverê ev serpêhatî û serdana Zîyareta Mem Şivanî weha şîrove kirine, “Ma mirazê herî mezin ne ew e ku mirov şad û bextewar be. Bextewariya herî mezin di dilê mirovan da ye ku kes nikare ji kesî bistîne. Gava hêvî û bawerî di dilê mirovî da çilmisî wê çaxê dil ji ber janê emanê dixwaze û mirov jar dibe, hêrs dibe, dikeribe, diqehire û neçar dimîne. Hêrs û neçarî, îrade û sebira mirovî bi mirov dide hisandin û mirovî diceribîne. Bi tenê hest û gura dilê mirovî helwêstê zêl dike, ev yek yan hezkirineka dildarî ye yan jî nefreteka têkçûyî ye. Tiştê Mem Şivanî kirîye Mem Şivan jî ev biryara wî ya zîz e.”

² bazgurî: lava kirin.



Rêwresmî Zemawendî
PÎRÎ ŞALYAR

Lokman Rehîmî ►



رێپۆرەسمی زەماوەندی پیری شالیار

رێپۆرەسمی "جەژنی زەماوەندی پیری شالیار" لە گوندی ھەورامانی تەخت لە مەودای ٧٥ کیلۆمەتری باشووری شاری مەریوان لە پارێزگای کوردستان (سنه) لە باکووری رۆژئاوای ولاتی ئێران ھەموو سالیکی دوو جار لە نیووی وەرزی بەھار و نیووی وەرزی زستان لە سێ رۆژدا بەرپۆرە دەچیت. گلکۆی پیری شالیار لە کۆتایی رینگای ھەورامان ھەلکەوتوو. بە بروای ھەورامییەکان پیری شالیار پەپرەوی ئایینی زەرتوشت بوو. رێپۆرەسمی رەسەنی پیری شالیار، یەکیکە لەو باوەرانیە کە لە نیو خەلکی ھەورامان لە ھەزاران سال لەو پێشەوێ خۆی گەیاندۆتە ئەمڕۆ و ھێمایەکی میژوووی راستەقینە لە ھاوبەشیی چالاکانە کۆمەلایەتی و ئایینی چین و توێژەکانی خەلکە و بەشیک لە میژوووی نەنووسراوی کوردستان دەگیریتەو. ئەم رێپۆرەسمە لە ھەوت قۆناغدا ئەنجام دەدریت:

١ - "خەبەر" یەک ھەفتە بەر لە دەستپێکردنی رێپۆرەسمی "زەماوەندی پیری شالیار" بە دابەشکردنی گۆتەکانی دارەکانی وەقف کراوی باغی پیری شالیار لە نیو خەلکی ئاوایدا، لە لایەن مندالان و لاوان خەبەر بلاو دەکریتەو و راگەیانندی کاتی بەرپۆرەچوونی ئەو رێپۆرەسمە ئەنجام دەدریت.

٢ - رێپۆرەسمی "کوته کوته" لە ماوەی ٥ رۆژ دوای رێپۆرەسمی خەبەر واتە سێشەمە ھەفتە ھەفتە دواتر لە کاتی رۆژئاوای مندالانی گوند بە ھاواری کوته کوته دەچنە بەر دەرگای مالان و خەلکی بە بیستنی دەنگی ئەوان دیتە دەری و نوقل و شیرینی و ... دەخەنە ناو توورەکە ھەندالانەو.

٣ - رێپۆرەسمی "کلاوڕۆچنی" ئەم داب و نەریتە لە لایەنی فۆرپەووە لە رێپۆرەسمی کوته کوته دەچیت، بەلام بایەختکی زۆری ھەیە. ئەم رێپۆرەسمە لە کاتژمێر ٥ بەیانی چوارشەمە دەست پێدەکات و تا کاتژمێر ٨ بەیانی کە نازەلە نەزریبەکان دیتن، درێژە ھەیە و لاوان بە گوتنی رستە کلاوڕۆچنی لە گوتسوان و بەردەرگای مالان، خاوەن مال و خەبەر دیتن و پیرۆزبایی بۆ بەرکەتی لە دایکبوونی پیری شالیار دەکەن و دیاری و شیرینی و ئاجیل لەوان وەر دەگرن.

Bawer Erîşen

Li gor teorîya etnosembolîzmê nirxandina

Destana

Kawayê Hesinkar

Kawa ji wan ra dibêje çend rojan rawestin, ev rewş ji bo min jî derd û xem e. Kawa serê sibehê diçe karî, kurexaneyê dadide û pêşmalka xwe ya çerm li nava xwe girêdide û li hesinê sar dide. Leşkerên Dehaqî tên kargeha Kawayî û ji bo êşa Dehaqî jê kurekî wî dixwazin. Kawa ji wan ra dibêje; “Ez dê şeva 21ê Adarê bi xwe kurê xwe bînim û diyarîyî Dehaqî bikim.” Leşker jê ra dibêjin, “Em dê vê mêranîya te ji Dehaqî ra vebêjin.”

Destpêk

Di serdema modernîst da ji bo şiyankirin û xurtkirina netewetîyê hêmaneka ku herî zêde sûd jê hatîye wergirtin mîtolojî ye. Ji mijarên mîtolojîyê yek jê destanên lehengîyê ne ku netewedewlet piştî xwe didinê û bi van destanan pesnê lehengî û vejîna xwe didin. Di vê xebatê da em dê Destana Kawayê Hesinkar li gor teorîya etnosembolîstan, di bin beşa mîta vejîna da binirxînin. Xebata me ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem da em dê kurteya Destana Kawayê Hesinkar¹ ya ku me ji pirtûka Gernas Koçerî xwendîye, bidin. Di beşa duyem da em dê bi kurtasî behsa teorîya etnosembolîzmê bikin û di binbeşa mîta vejîna da jî Destana Kawayê Hesinkar binirxînin. Di beşa sêyem da em dê hin simbol û remzên ku di destanê da derbas dibin, bi awayên wan yê mitolojîk bidin û di çarçoveya destanê da van simbolan şirove bikin. Di dawîyê da em dê encam û nirxandinê binivîsin û çavkanîyên ku me jê îstîfade kirine bidin.

1 Gernas K. (2009). *Destana Kawayê Hesinkar*. Stenbol: Weşanên Aramê.

1. Kurteya Destana Kawayê Hesinkar

Qraleki bi navê Dehaq hebûye. Gelekî zordar, bêbext, har û hêç bûye û her kes jê tirsîyaye. Paytexta dewleta wî Nînova bûye û gelê medî û asûrî jî di bin destê wî da bûne. Rojekê Dehaq derketîye ser textê xwe û ji derdora xwe ra gotîye, “Heta Hindistanê ez dê sînorên welatê xwe bikim yek.” Piştî ra ji kesên li qesrê ra gotîye, “Medan gelek xort û mêrxas û egîd ji me kuştine, divê em nehêlin ew li hember me bibin hêz.” Bi van gotinên wî ra wezîrên wî yê li rast û çepê, bi axaftin û gotinên xwe piştgirî dane gotinên Dehaqî.

Şevêkê dema ku Dehaq di xew da ye dikeve tayê û êşa wî zêde dibe. Ji ber êşa nava wî, milên wî diwerimin û serê her du girmilên wî diteqin û dibin birîn. Nojdar tên, lêbelê ji nexweşîya wî fam nakin. Di dawîyê da wezîrên wî nojdarêkî din tînin û ew ji nexweşîya Dehaqî fam dike. Nojdar ji Dehaqî ra dibêje, “Dermanê nexweşîya te mejîyê xortên çardehsalî ye. Ez dikarim bi vî awayî êşa te bidim sekinandin.” Dehaq emir û fermanê li wezîr û serbazên xwe




Fatma Şahîn ▶


Bawerîyên gelêrî yên Agirîyê

Dirik

Di esilê xwe da dara şîlanê ye. Dara şîlanê, li çîyan bi tena serê xwe şîn dibe. Ev dara ku bi tena serê xwe şîn dibe wekî zîyaretê ye. Mirov diçin ser wê, dia dikin û bendikan pê ve girêdidin.



Hin xurafe jî belkî wekî çandê derketine, lê ev çand her ku domdar bûye guherîye û wekî bawerîyeka olî di nava gelî da cihê xwe girtîye.

 Ferhat Arslan

Bawerîyên gelêrî¹ tê wateya raman û bawermendîya ku xwe naspêre bawerîyeka olî yan jî zanistekê. Li gorî agahîyên ku me bi dest xistin, di lîteratura cîhanê da cara ewil ev cure bawerî li cem feylesofên Romayî hatine dîtîn. Ango cara ewilî tasrîfên kategorîk yê derbarê tiştên ku li gerdûnê rû didin û xurafeyên bawerîyan e, di serdema feylesofên Romayî da tên dîtîn.

Tê zanîn ku gel olê ne li ser bingeha zanistê, bi rêya efsane, xurafe û rîtuêlan tê digihê. Mirov bûyerên ku nikarin bi rêya hişê xwe îzah bikin, bi mîtan û efsaneyan ve girêdidin. Lewra mirov ji tiştên mîstîk hez dikin. Loma jî hin bawerîyên pûç, bingehên xwe dispêrin olê, lê di nava demê da rengê çandî girtine û ketine nava jîyana rojane. Ev xurafe ne, û encama ceribandî, lêpîrsîn yan jî tatêlekê ne.

Hin xurafe jî belkî wekî çandê derketine, lê ev çand her ku domdar bûye guherîye û wekî bawerîyeka olî di nava gelî da cihê xwe girtîye. Gelek bawerîyên bi vî rengî jî ji çanda ereban hatine û bi rêya ola îslamê ketine nava gelên din. Wekî nimûne di Quranê da gava ku qala

kafirana (kesên ku înkare dikin) dihê kirin, têgiha “zûlkadiye” derbas dibe. Ev peyv tê wateya “asman”î, ango wekî çavên şîn dihê binavkirin. Di civaka ereban da çavşînî, rengê çavên Bîzansîyan e ku ew li Anatolîyê niştêcih in. Di heman demê da ji ber ku ew enerjîya nebaş ya dijmin e, loma bi gelemperî çavên şîn di nava civakê da jî bi nezerê ve hatiye wekhevîkirin. Ji bo xweparastinê jî morîya şîn dihê bikaranîn. Gava ku mirov bi hûngulî li ser xurafe yan jî bawerîyên batilî kûr dibe, mirov dibîne ku gelek xurafe bi vî rêyê ketine nava xelkê û di nava demê da xelkê ew pejirandine.

Gelek bawerî hîn di zarokatîyê da dihên hînbûn û bêyî ku bihên rexnekirin heta dawîya jîyanê dihên pejirandin. Faktora herî giring ya ku van bawerîyan domdar dike jî bawerîlêanîna feydeya wan e. Lewra heke mirov bizane ev bawerî li dijî hiş û aqilê mirovan e jî ji ber feydeya wê dest ji wê bernade. Li gel van agahîyan em dibînin ku bawerîyên pûç, herçiqas bi asta perwerdeya gel yan jî ola ku jê bawerî dikin li hev neyê jî, ji ber ku ji hêla pîsikolojîkî ve feydeyekê dide mirovan hîn jî di nava jîyanê da cih digirin. Loma jî heta ku xwestina zanebûna dahatûyê, ewlebûn, tirs û neçarî li ba mirovan hebe ev bawerîyên pûç jî dê her hebin.

¹ Ji bo bawerîyên gelêrî navên curbicur tên gotin: Batil, bawerîyên batil, bawerîyên batînî, bawerîyên berê, bawerîyên gelêrî, bawerîyên kevn, bawerîyên tewş, bîr û bawerîyên gelêrî, kevnabawerî, kevnêhîzrî, pêbawerî û xurafe. Me di xebata xwe da navê “bawerîyên gelêrî” bi kar anî.



Cemil Şelazî

Êkem berhemê wî wek pertûk hatîye çapkirin û belavekirin pertûka "Gotnêt mezinan li Devera Behdînan" li sala 1986ê hatîye çapkirin. Piştî serhildana pîroz a sala 1991ê dîsan di pîranîya wan rojname û kovarên li Herêma Kurdistanê derkeftin babetên xo tê da belavkirîne.

Jîn û berhemên folklornas

Hecî Ce'fer

Kurtejin

Navê wî Hecî Ce'fer Haris e, sala 1951ê li gondê Xurkê, li devera Mizwîrî Jêrîya hatîye ser vê xemgehê, xwandina seretayî û navincî li Miwîsilê bi dûmahî hînayne, xwandina amadeyî li nahya Elquşê bi diwîmahî hînayne, li sala 1970-1971ê, li Kulîja Edebyata li Danşka Bexda, li pişka zimanê kurdî hatîye wergirtin. Li sala 1974ê geheştîye Şoreşa Îlonê û bûye pêşmerge. Li sala 1975-1976ê careka dî xwandina xo ya zanîngêhê bi diwîmahî hînayne, bi pileya baş. Paşî bûye mamosta li qotabxanên seretayî, navincî û amadeyî, herwesa li Peymangeha Mamustayan û Perwerda Werzişî li Duhokê ders gotîne. Sala 1982ê bûye endamê Êketîya Nivîserên Kurd, niho jî Endamê Êketîya Nivîserên Cîhanî ye û Pena Kurd.

Sala 1996ê berev welatên Ewropa çûye û li Welatê Elmanîya bûye penaber, ta naverasta sala 2005ê li Elmanîya wek penaber jîyaye û bûye mucenîsê wêrê. Paşî li naverasta sala 2005ê vegeerîyaye ve Herêma Kurdistanê, li bajarê xo Duhokê akincî bûye ve û heta niho û li 1/7/2014ê hatîye xanişînkirin û li ser kar û xebatên xo yê berhevkarî, wergêran û nivîskarîyê berdewame.

Karê nivîsîn û komkirina folklorî

Her li naverasta salên 1970ê were dest bi nivîsîna gotarên edebî, zimanî, rexneyî, folklorî û wergêranê kirîye û di pîranîya wan kovar û rojnamên kurdî, ewên li 'Êraqê derdikeftin yê mîna "Karwan, Beyan, Roşinbîrî Niwê, Rengîn, Rojî Kurdistan, Otûnûmî, Hawkarî, Paşkoyî 'Êraq, Bizav" babetên xo tê da belav kirîne. Li destpêka

1 [Edîtor] Ji ber devoka taybet ya Devera Behdînanê me pêdaçûn li ser nivîsê nekiriye.


salên 1980îyan dest bi kumkirna folklorî kirîye, ew jî bo cara êkem bi rêya şagirdên her dû qotabxaneyên Amadeya Bazirganî û Amadeya Pîşesazî li Duhokê.

Êkem berhemê wî wek pertûk hatîye çapkirin û belavekirin pertûka “Gotnêt mezinan li Devera Behdînan” li sala 1986ê hatîye çapkirin. Piştî serhildana pîroz a sala 1991ê dîsan di piranîya wan rojname û kovarên li Herêma Kurdistanê derkeftin babetên xo tê da belavkirîne. Bi dehan kur û simînar li dûr babetên folklorî pêşkêşkirîne û pişikdarî di dehan vîstevalan da kirîye li Duhok, Hewlêr û Silêmanî, her dîsan li derveyî welatî taybetî li Elmanîya. Heta niho 30 pertûkên çapkirî hene, ku piranîya wan folklorî ne, zêdebarî çend pertûk ji wan jî vekolînên cur bi xo ve girtîne û dîsan çendîn pertûk ji zimanê elmanî jî wergêrayîne ser zimanê kurdî, devoka behdînanî.

Berhemên wî yên çapkirî

a- Berhemên folklorî

1. Gotnêt mezinan li Devera Behdînan, Bexda, 1986.
2. Stiranêt dawet û govendêt kurdan, Bexda, 1986.
3. Stiranêt şeveroka, Bexda, 198.
4. Heyranok ji kelepûrê kurdî, bergê êkê, Hewlêr, 1989.
5. Hindek kevnebawerêt xelkî li Devera Behdînan, Bexda, 1993.
6. Stiran û yaryêt biçûkan, Silêmanî, 2006.
7. Pejn û gotinêt kurdî, Duhok, 2006.
8. Qefteka stiranêt folklorî, Hewlêr, 2007.
9. Carekê ji cara (çîrok bo zaroka), Silêmanî, 2007.
10. Heyranok ji kelepûrê kurdî, bergê dûyê, Duhok, 2007.
11. Gilavêj (komeka çîrok û serhatîyêt folklorî li Devera Behdînan), Silêmanî, 2010.
12. Hindek vekolîn li dor folklorê kurdî, Hewlêr, 2013.
13. Çîrok û çîvanok (ji folklorê kurdî), Silêmanî, 2017.



b- Vekolîn û rexne

14. Bo her nivîserekî gulek, pişka êkê, Bexda, 1986.
15. Çend vekolîn li dûr Mem û Zîna Xanî, Berlîn, 2002.
16. Ziman û edeb û mêjûya Kurd di Kovara Rojî Kurd da, Duhok, 2008.
17. Bo her nivîsevanekî gulek, pişka dûyê, Hewlêr, 2016.

c-Pertûkên wergêrayî ji zimanê elmanî

18. Ji pendên elmanî, Duhok, 2000.



Amadekar:
Mehpûs Serhedî



**Nexweşî,
dermanên nexweşîyan û
awayên dermankirinê yên
berê li Qerejdaxê**

Me ji boy nexweşê ku bi kurikê diketin mastêrk digerland. Me mastêrka xwu digirt em diçûn mala cînarê xwu me li derî dixist, wexta ku cînar destê me da mastêrk bidîta qet tiştik nedipirsî. Yanî gere mera xeber neda, jixwu isûl wisa bû, gere ê dihat li derî xist jî xeber neda, te jî xeber neda tiştik nepirsîya ji boy çî yi, mesele çî yi. Yanî zanîbûn tu hatî çî. Me bi qirika mastêrka xwu digirt li derîya dixist, kî derketa çawa ku mastêrk didît diçû hinik rûnê nivîşk tanî di alî hundur va bi cîyekî mastêrkê ve dizeliqand. Em wisa wisa diçûn sê yan jî çar mala, her malekî hinik rûnê nivîşk bi cîyekî mastêrkê va dikir.

Min li gundê Alçîmanê derheqa nexweşî, derman û dermankirinên nexweşîyan yên li Qerejdaxê da ev agahî ji Yazê Kose û Xecê Koseyê hildane.

“Meta Yazê berê di nava we da kîjan nexweşî hebûn, we ew nexweşîyên xwe çawa sax dikirin, bi kîjan derman sax dikirin?” Yazê Koseyê navê nexweşî û dermankirina wan yên ku dizanîbû yek bi yek digot, carinan jî jintîya wê Xecê Koseyê alîkarîya wê dikir. Wan çawa gotibe min wisa nivîsîye.

1. Nexweşîya sermagirtin û dilêşê¹

Yazê Kose:

“Wexta ku me, gedê me serma bigirta yan jî dilê me biêşîya, me diçû pûng dianî dikedand, çend cara ava wê vedixwar. Ku me ava pûngê vedixwar me pê ra jî xwîdan dida, laşê

¹ dilêş: di wateya zikêşê da dibêje.



Jiyan Ozkan


me nerm dibû, em wisa him ji dilêşê him jî ji nexweşîya sermagirtinê xilas dibûn.”

2. Nexweşîya kul û êşa çavan

Yazê Kose:

“Ku di çevê însana da kul bihata yan jî em bibên ku çevê wan ji qilêr milêrê nexweşî hilda

Xaçpîrsa folklorê



◀ Oktay Altûn

Ji bo bersivan
li rûpela 109'ê
binêrin.

Ji çepê ber bi rastê

3. Pirtûka lahût ya bawerîya zerdeştîyê.
5. Di bawerîya êzîdîyê da milyaketê herî payebilind. Li gorî bawerîya êzîdîyan ev milyaket, ji aliyê Xwedayî ve pêşî wekî serhildêr hatîye qebûlkirin; lê paşê hatîye efûkirin û wekî rêvebirê dinyayê hatîye peywardarkirin. "Melekê"
7. Rûnê ji şîrê nû/teze dihê bidestxistin. Donê esil. "Rûnê"
8. Di vê radyoyê da nêzi 4000 kilamên dengbêjîyê hatine tomarkirin. Radyo, ji sala 1955an vir ve li paytexta Ermenîstanê Êrîvanê bi kurdî weşanê dike. Gelek dengbêjên navdar li vê radyoyê strîne.
9. Kanî yan jî birka ku ava wê germ e û bo tenduristîyê baş e. Bi taybetî kesên ku ji hestiyên xwe nexweş in yan jî temenmezînan diçin wê derê. Av germ e, xwezayî ye û ji binê erdê dertê.
10. Di gelek biwêj û gotinên pêşîyan da heywanê ku hêz, wêrekî û çelengîyê temsîl dike. "... .. e çi jin e çi mêr e.
11. Ava tirîyî ku bi kelandinê hatîye tîrkirin. Dob, mot, doşav.
17. Çilmîsîna wê kulîlkê di nava gelî da wekî xelasbûna evînê yan jî dîrketina ji evîndarê/î dihê qebûlkirin.
18. Di kilamên Ewdalê Zeynikêyî da heywanê baskşikestî. Ewdalî, li ser vî heywanî kilam gotine.
19. Karekî zevî û bexçeyan.
20. Stranên dînî ne ku bi vî şikilî mirov daxwazên xwe ji Xwedayî dikin yan jî pesnê Xwedayî didin. Lava, îlahî.
21. Di Destana Dewrêşê Evdîyî da navê hespê Dewrêşê Evdîyî ye.

Ji jorê ber bi jêrê

1. Navê fermî yê dengbêjî Seydo Şîmşek e (1933-2020). Dê û bavê wî zû mirine, ew sêwîyê ber destê ap û amojînê ye. Dengbêjî, 25 salan karê boyaxkirina şekalan kirîye; ji ber jî navê boyaxvanîyê li ser navê wî maye. Yek ji denbêjên "Mala Dengbêjan" ya Amedê ye. Hin ji kilamên wî ev in: Têlî, Keçîka Qereçî.
2. Bajarekî kurdan yê dîrokî ye ku çîroka Zembîlîroş û Banê/Gul Xatûnê li wê derê qewimîye.
4. Gava ku kesên mêrxas û egîd ne li holê bin yê ne mêrxas xwe dixin şûna mêrxasan û xwe egîd dihesibînin. Ev biwêj bi şikilê "Di xelaya mîran da navê mişkî Evdîrehman e." jî dihê gotin. "... .. ne li malê ye, navê mişkî Evdîrehman e."
6. Adeta şîvdayîne ya piştî mirîyan e. Gel wilo bawer dike ku piştî mirîna kesekê/î divê malbata mirîyê/î, 40 rojan (li gorî hin kesan salek) şîvê belav bike. Li hin herêman êvarên îniyan dihê belavkirin.
12. Li gundan cihê ku çop, arî, gubre û gemar lê tê valakirin. Di gotinên pêşîyan da carinan wekî wargeha dîkan dihê nîşankirin. "Dik di bin kêrê da, çavê wî li serê ... ye."
13. Şeva ku Qurana lahûtî daketîye rûyê dinyayê. Şeva roja 26an ya meha remezanê. "Şeva"
14. Cureyeka edebîyata gelêrî ye. Bêyî ku navê tiştekişkere bihê gotin, taybetmendiyên wî tiştî dihên rêzkirin û guhdar li gorî van taybetmendîyan navê tiştê/a tê pirsîn texmîn dikin. Têderxistinok.
15. Di destaneka kurdan da hezkirîyê Xecêyê ye. Di dawîya destanê da li quntara Çiyayê Sîpanê pêşî hezkirîyê Xecêyê jî ser zinarî dikeve, pê re jî Xecê xwe diavêje û di encamê da her du jî dimirin.
16. Destaneka kurdan ya li ser şer û berxwedanê ye. Li Kurdistanê Rojhilatê, Herêma Biradostê pêk hatîye. Mijar, şerê Şah Ebasê Ecem û Emîr Xanê Lepzêrînan e.

Yomsiz Yomsiz i*

Hatîce Aktay-Helbest Çetîn

Yek hebû, dibê pir feqîr bû. Lê ji wî feqîrtir kes tune bû. Û dikana wî hebû, a wî û a gawir li ber hev bû. A yekî file. Û dikana mêrkê file tije dibû û a wî kes nedîçûyê heta êvarê. Gedê wî ji birçîna dimirin. Rokê qral go:

“Hela herin law ma -ji wezîrê xwe ra go- di wî bajarî de kî feqîr heyî. Ma her mêze kin.”

Çûn. Go:

“Weli hal hewalê vîya ji vi ra heta vira wa yi.”

Ji wezîrê xwe ra go:

“De ka va zêrê mezin şevê yekê tê xin tepsîyê û ser wî tijece peqlewe bikin û şevê jê re yekê bişînê heta çil royî. Çil heb van zêrê mezin jê re herê qey wê hinkî durma¹ wî xweş bibi.”

Go rabû êvarê jêr tepsîkî peqlewe hat. Ê mêrkê file baqil in. Go padîşah berasebep beraheq û qral tişkî xwe nadi xelkê. Go evîya tişkî tede yi. Go:

“Qûzûmmm ma tu yê çî biki ji peqlewê, gedê te wa ji birçîna dimirin. Ka ez ê deh mîlonan bidim te, hema peqlewa xwe bidi min ez ji gedê xwe'r bibim, bira gedê min bixwin.”

Mêrik daê, daê, daê. Her şev were yi, her şev. Heta çil royî.

1 durm>durum: peyv bi tirkî ye, tê maneya rewşê, lê li vir maneya wê aborî ye.

Go em herin ma wele me çil heb zêr dayê, niha durma wî xweş i. Go Xwedê û pêxember ji berê xirabtir in. Go, “Weee!” Go jê'r gotin. Go:

“Weli min wanî kirîyi, hal hewalê mêrkê file li min wer kirîyi.”

Qral go tamam, de herin bînin werin. Çû wezîr, destê wî girtin, wî anîn hatin. Bêrkî, kuregek² vanê çopçîya xistin desta. Go “Bigrin herin xizînê, bira wanî lêxi, çend heb ketin ser bira jê ra bi.” Go çû. Kurega xwe lê xistê, zêrkî tenê ket ser. Go zêrik tenê ket ser, hatin ji qral ra gotin, go “Weli me bir çû xizînê û vêya mezin hew zêrik tenê ket ser.”

Ê de [qral] go, “Rabin wî bibin herin, tarla³ mi heyî, kevirî bidin desta, bira bavê,⁴ heta ku kevir çû wê tarlê gi jê ra bi.” Kevîrê xwe anî, kevîrê wî go req di nigê wî'd lê ket. [Qral] ji wezîrê xwe'r go:

“Bibin herin. Hûn dikuvin bikujin, hûn davên bavên, evya yomsiz i, yoma vîya di min jî bigeri. Bibin herin ma laaaw! Neece ji peqlewê karkî kir, ne ji xizînê karkî kir, ne ji tarlê karkî kir.”

Îja ew jî ev i, yomsiz yomsiz in. Ka merû bêji çî.

2 kureg: bêr, bêrik.

3 tarla: erd.

4 bira bavê: bila biavêje.

* yom: şens, talih, bext>yomsiz: bêyom, bêtalih.



Zarbêj Gulo Çaliş

Berhevkar: Hatîce Aktay-Helbest Çetîn

Zarbêj: Gulo Çaliş

Temen: 67

Perwerde: Nexwende

Herêm: Gundê Qirçatkê/Çinar/Dîyarbekir

Dîroka berhevkirinê: 26.12.2018

Rostemê Zal û Selmanê Sindî

Vîdan Sevîm



Ê go:
“Biray’em wile ez qîza paşayê filan şehrî me û dêwê Canpolat min girtîye anîye xistîye vê derê ka mê çab’kin? Ti çi kes î derê, biray’em go dêw rabe ê te bikûje.”

Go:
“Hare jê re bê yekî ji Îranê hatîye şerê te.”

Çû go:
“Wile merivek hatîye şerê te.”

Go:
“Bira hare, mi wî da xatirê te. Mi adiz neke, go jixwe diranê dêşê, ez ê wî tê xim ber kevîya diranê xwe.”

Hat. Go:
“Hare bê Rostemê kurê Zal hatîye şerê te.”

Ku wisa got dibê vî kafirî kete tayê, go şinşindira wî li hev ket.

Go:
“Hewar e, meriv bibe peşkek ava reş binê heft behra meriv ji ber mala Zalê xilas nabe, ev di kur derket.



Zarbêj Suleyman Aksoy

Hebû carek ji cara, rihme li dê û bavê hazir û gohdara, nale li şeytanê ber qulkê dîwara.

Zalê Zengozêrîn hebû, mezinê mala Zalê bû. Bavê Rostem bû. Dibê rojekê Zalê Zengozêrîn derket go ez ê herim ref û nêçîrê. Derket ref û nêçîrê, dibê dîna xwe dayê ewkek lê qelibî, çiyakî hate bi ser de. Rihênt zilameke li hespê siwar e, guhê hespê diçe ber perê ewran. Di nava topraqê wî de ye, go:

“Elahûekber, go însan hewqa jî mezin heye?”

Zalê bi cireet e, qewet tine jê re. Dibê Zalê gurzek bilind kir, gurz di nava serê wî xist, dibê hê sê mû serî netewand. Zilam go:

“Feqîrok bi mi re heneka neke, ev der ne topraqê te ye, topraqê Zalê Zengozêrîn e, em derên hê heneka bike, ev der ne cîyê heneka ye, bi Xwedê pê bihese ê serê min û te tev jê ke.”

Zalê gurzeke din derxist li nava serî xist, go:

“Çi kafir e vîya.”

Lê xist, hema rahişte bi destê Zalê girt, di ta ji simbêlê xwe rakir, yek avête destê wî û yek avête her dû piyê wî, avêt tereka zînê xwe li ser piştê hespê xwe kir û bi xwe re bir û çû. Go:

“Feqîrok bi qûran dîna xwe didimê ti nahs î, ez çîqa ji te re dibêjim ne topraqê min e. Topraqê Zalê Zengozêrîn e, bi me bihese ê me her duya jî bikuje.”

Navê wî seh kirîye, lê nizane kû ew e. Wele hew wî bir û çû derxist, dîna xwe dayê zengûyê hespê wî tev zêr. Dibê:

“Ti çi kes î, dibê rast bêje?”

Dibê:

“Wele ez Zalê Zengozêrîn im.”

Weyyy go:

“Xwelî li serê min û heftê bavê mi be, hewqa sal û zeman ji tirsê te newêribûm bi vî topraqê kevîm, ti ev mêr î, mi te bi di ta simbêlê xwe girêda?”

Go:

“Wile ez im.”

Go:

“Wile te nakujim, madem te rast go ti heyf î, te nakujim, lê tê bi mi re soz û ad bidî kû ti herî Rostemê kurê xwe bişînî şerê min, ez ê te berdîm. Bi Xwedê ti Rostem neşînî ez ê serê te jê kim.”

Lihevanînokek ji Geverê

Rojbîn Tekîn

Carek ji caran
Rehmel day û babê guhdaran
Dirafe ji Amidîyê heta xayê¹
Hûwête² ser mal û maldara
Mal û maldaro, malvêrano
Xanî ber geryano
Dît hilbankey dani
Hûwête heft li gor babê xwidani
Dîkil û mîyîşk³ bû erzanî
Feqî jara bû giranî
Goti şemalê şemaldayê
Seyê te ber sotinê
Seyê min ber biryarê⁴
Şevên çîya dirêj e
Bû me hekayetekê bêje

Gotê qîqanê qîqanê
Yaptûq û marcanê⁵
Dîkê kelê kanê
Dîkê kelê kujtin

1 xayê: xarê.

2 huwête: hawêtin.

3 mîyîşk: mirîşk.

4 biryar: bivir.

5 yaptûq û marcan: yaqût û mircan. Du kevîrên giranbiha.

Ehya⁶ beg rûniştî
Ehya beg têz e
Qeytan kin e rêz e
Qeytana mamê min e
Mamê min dijminê bejna min e
Bejna min çinay e⁷
Nextê min hizay e⁸
Hizara Romê ye çekçeqa Memê ye
Mêma Salih Begi
Sêva ser kileki⁹
Diçim sêva jê kim
Bêhna gila tê kim
Silava Memê kim
Memê çûye sûkê
Kirî cilê bûkê
Bûka me hewşê da
Cotek kuran koşê da
Osmano Osmano
Kûla Roma girano
Serdarê romîyano
Romîyan romek¹⁰ lê da
Hewş te bipî, Osman xendiqî...

6 Ehya: Navekî mêran e, Yahya.


7 çinay e: çinar e, dareka bejindirêj.

8 hizay e: hizar e.

9 kilek: ji pacyên biçûk ra tê gotin.

10 romek: rim, xencer.

Berhevkar: Rojbîn Tekîn
Zarbêj: Mewlûd Tekîn
Temen: 56
Perwerde: Nexwende
Herêm: Gundê Qadyayê/
Gever/Colemêrg
Dîroka berhevkirinê: 2018

 Mazlûm Siyabend



Rûvês

Dema koka wê tê derxistin qalikekî reş li ser e, reşekî ne zêde tarî û girtî. Bi kêrê qalikê li ser kokê tê qeşartin, binê qalikê spî ye. Qederekê ku hewa lê dixê pê ve rengê kokê ber bi rengê soreyê qehweyî ve diçe.

Ayela Zarto



Koka qeşartî, tê hûrkirin û dû ra tê hişkkirin. Dema tê hişkkirin jî rengê wê sore ye. Koka hişkkirî tê kelandin û wekî çayê tê vexwarin. Bi terîti jî tê xwarin, lê hin kes jê jî dikelînin û ava wê vedixwin. Li gorî palpiştan ava wê jî şîfa ye.

Xweza, cih û warê efsane û mîtolojîyan e. Mazûvanîyê ji gel, bawerî, ol, nijad û hwd ra dike. “Di bawerîya zerdeştîyê da, mirovê ewil Keyumers/Geyumert yê ku ji alîyê Ahûra Mazdayê qencîxwaz ve hatîye afirandin, ji alîyê Ehrimenê xêrnexwaz ve tê kuştin; tav, tovê wî çil salî dadipalîne û ji wî tovî rûvês zîl dide. Di pişt ra, rûvêsa ku zîl dide vediguhere jin û mêrê ewil yê fanî ku navê wan Meşyane û Meşyeyî ye.”¹

Navê fêkîya balkêş û cuda ku min nîyet heye ez di vê nivîsê da qal bikim “rûvês” e. Rûvês, navê wê ye bi kurmancî ye. Ji xeynî vî navî bi navên rîvaz, rêvas, rêwas, rêwaz, rimbês, rimbêz û ruvêsê jî tê naskirin û gotin. Bi zaravayê kirmanckî jê ra “hîrey” tê gotin. Bi zimanê farisî hem “rêvas” hem jî “eşkin”, bi zimanê ermenîkî jî “xavirdzîl”² tê gotin. Li gor palpiştan hin şênî jê ra dibêjin “Mûza Kurdistanê.” Li gorî hin nijad, herêm û bajaran, navê rûvêsê tê pey navê nijad, herêm û bajaran û tê gotin. Wekî “Mûza Kurdan”, “Mûza Zazayan”, “Mûza Dêrsimê.”

Rûvês, li çîyayên sar û bilind şîn tê. Bêtir jî cih û warên ku lê şîn tê, cihên bi kevir û xîç in. Li hin çîyayan jî, di nav zinar û tehtan da hêşîn dibe. Ax û kevir divê di nava hev da bin. Tenê di nava axê da pir baş dernakeve; kevir, şûjîk û zinar çiqas zêde bin ewçend bêtir derdikeve û xweşîktir dibe. Li deşt û berîyan ji ber germahîyê hêşîn nabe.

Rûvês, li gorî rewşa hewayê, kêr zêde piştî nîvê meha nîsanê hêşîn dibe û heta dawîya meha gulanê heye. Lê li çîyayên pir bilind ku berf û sermaya wê zêde ye, heta meha hezîranê jî di bin berfê da hêdî hêdî hêşîn dibe. Çer ku berf dihele, bi bejn û bala xwe ya nazik û rengîn xuya dike. Emîrê wê heya meha hezîranê ye. Pişt ra qert dibe û tov digire.

Rûvês, bi qasî em hîn dibin, ji xeynî Herêma Pasûrê, li alîyê Serhedê, Dêrsim, Çewlik, Wan, Colemêrg, Bedlîs, Agirî, Erzerom û li

gelek çîyayên bilind yê Kurdistanê hêşîn tê. Li Îraqê jî li alîyê Zaxoyê, li quntara çîyayan hêşîn dibe.

Tûmê rûvêsê ku bi qasî niv metreyekî radi-be, paşê kulîlk dide. Rengê kulîlkên wê spî ne, spîyekî mîna cemedê ye. Kulîlkên wê heta berîya tov bidin topik û dirêj in, ku tov dide û pê ve wekî rîsî dirêj dibe. Kêr zêde panz-deh bîst santîmî dirêj dibe. Gava ku kulîlkên wê vedibin wekî kovîkê vedibin û fireh dibin. Zêde bêhna wan nîn e, lê ji ber ku nazik û nazenîn in kêfa mirovî ji wan ra tê. Dema dest bi çilmîsînê dikin jî di şikilê kovîkê da tov digrin.

Pelên wê pir mezin, wekî şikilê sîwankê ye. Hin jê sê çar pelî ne. Li gorî emîrê wê, çiqas stûr bibe pelên xwe ewqas zêde dike. Her tûmekî wê herî kêr du, herî zêde jî çar pelan digire. Di sala ewilî da ku hêşîn dibe yek pelî ye, dû ra li gorî salan dibe didu, heta ku koka xwe stûr kir pê ve îcar dibe sê çar pelî. Pelên wê ji alîyê gundîyan ve nayê xwarin. Tama pelên wê tîrş û mîz e. Carnan hin gundî jê, damarên nava pelên wê jî mîna rûvêsê diqêşêrin û dixwin. Piştî hêşîn bû şûnda di nava mehekê da qert dibe û nema tê xwarin. Di meha hezîranê da êdî pel zer dibin û nêrika navê jî qert dibe. Tov digire. Nêrik (rûvês) jî, di her koka tûmekî da, du sê heta çar heban jî diavêje. Ango çar heb rûvês di cihekî da bi hev ra diavêjin û dirêj dibin. Heta çar nêrik jî di yek kokekê da dikarin biavêjin. Dema yê teze bin, yanî emîrê wan ne zêde be, rûvêsên wan jî hûrik in. Rûvêsên diavêjin jî ji bihustekê heta du sê bihustan dirêj dibin. Rûvês, ji alîyê vîtamîna Cyê ve pir dewlemend e û vîtamînen A, B1, B2, E û Kyê jî te da hene.³

Li gor gotina palpiştan hin kesên ji alîyê Serhedê û Kurdistanê Başûrî, kapê⁴ wê jê dikin û wekî rûvêsê diqêşêrin û dixwin. Îcar ew hinekî zêde şîrîn tê. Ên ku nexweşîya şekirî bi

1 <https://tr.wikipedia.org/wiki/1%C5%9Fg%C4%B1n>.

2 Behcet Avci: Şênîyekî Pasûrê.

3 <https://www.saglikaktuel.com/bitki-ansiklopedisi-uckun-isgin-nedir-faydalari-nelerdir-1724.htm>.

4 kap: bistî.

wan ra hebe divê hay jê hebin û zêde nexwin.

Tovên wê di rengê soreyê girtî da ye, ku li ser qehweyî ye. Di şikilê sêqorzî da ye. Sê perik pê ve ne, her yek li qorzîyekê ye. Dendikên spîkî biçûk di hundirê tovê wê da ne. Hema parîkî ji dendikên gula berberoj biçûktir e. Hundirê tovê wê wekî kakilê gula berberojê ye. Qalikê li ser jî sor e. Serê her rûvêsekê nêzîkî kulmekê tov digire. Hin heywan jî ji tov û pelên wê hez dikin û dixwin. Hin teyr û tilûrên wekî qijikên reş, ji tovê wê hez dikin, nexasim jî kêfa bizinan pir jê ra tê. Herçendî ku tovê wê tê xwarin jî, şênîyên li herêmê zêde guh nadinê, naxwin. Ji ber ku tovê wê pir sivik e, bi ber ba û bahozan dikeve û li çol, çîya û newalan belav dibe. Bi vê rêyê bixwe şîn tê û zêde dibe.

Koka wê gir e û bi qasî metre û nîvek du metreyan xwe rast ber dide binê erdê û kûr dihe-



re. Koka wê zû bi zû çetelî nabe. Ku di binê erdê da rastî kevirêkî bê, yan kevirî qul dike tê ra derbas dibe, diçe; yan jî berê xwe diguhere û ji xwe ra rêyekê dibîne. Şikilê kokê dişibe lûleyê û bi qasî milê mirovekî navsere stûr e û emirê wê dirêj e. Koka wê bi sedsalan dijî. Hişk nabe, xerab nabe, di cihê xwe da hêşîn dibe. Salekê tov digire, salekê tov nagire. Sala ku tov digire nêr e û tê xwarin, sala ku tov nagire mê ye û nayê xwarin. Sala mê be, tenê pel pê ve heye, sala nêr be nêrikan (rûvês) digire û tê xwarin. Dema koka wê tê derxistin qalikekî reş li ser e, reşekî ne zêde tarî û girtî. Bi kêrê qalikê li ser kokê tê qeşartin, binê qalikî spî ye. Qederekê ku hewa lê dixê pê ve rengê kokê ber bi rengê soreyê qehweyî ve diçe. Koka qeşartî, tê hûrkirin û dû ra tê hişkkirin. Dema tê hişkkirin jî rengê wê sore ye. Koka hişkkirî tê kelandin û wekî çayê tê vexwarin. Bi terîtî jî tê xwarin, lê hin kes jê jî dikelînin û ava wê vedixwin. Li gorî palpiştan ava wê jî şîfa ye. Koka wê dermanekî gelekî bi fayde û navdar e. Bi taybetî ji bo kezebê,⁵ hinavê, ferikandin, şekir, kolesterol, bawesîr,⁶ vereşandin,⁷ stres, serma, bêhalî, bêxewî, penceşêra mahdeyê (mîdê) û rûvîyan pir baş û şîfadar e.

Li gor ku palpişt dibêjin, mirov koka wê bikelîne û serê sibehan bi xurînê û êvaran jî berîya razanê qedehêkê jê vexwe, ji bêhnçikandinê ra hew dibe. Gewrîya mirov wekî egzozî erebê fireh û paqij dike. Di panzdeh bîst rojî da gelek ferqî çêdibe. Koka wê divê zêde neyê kelandin û ava wê pir ne girtî be; ji ber ku mirov du sê rojan ser hev vexwe roja sisîyan emelî dibe, loma divê mirov hay jê hebe. Mirov sê çar parçeyan ji koka hişkkirî biavêjê nav avê bes e. Koka wê hem tê kelandin hem jî tê hişkkirin. Di pey ra, tê kutandin û tê xwarin. Li Çewligê ji bo pîrzik û dexmên (leke) li ser ser û çavên mirovî, koka wê ya hişkkirî ku tê hêrandin tevî mastî tê kirin, di pişt ra

⁵ Serpêhatîya Celal Uçari, li dawîya nivîsê ye.

⁶ <https://tr.wikipedia.org/wiki/1%C5%9Fg%C4%B1n>.

⁷ <https://www.saglikaktuel.com/bitki-ansiklopedisi-uckun-isgin-nedir-faydalari-nelerdir-1724.htm>.

di ser pîrîzîk û dexman tê dayîn û belavkirin.⁸ Dema rûvês tê qeşartin û tê xwarin, mirov heger hinekî di diranê xwe bide, diranê mirovî dike wekî cemedê; paqij dike, ji macûnê çêtir e. Zenga li ser diranan tev radike û diavêje.

Şênîyên herêmê dema çîninê ewilî kulîlkên serî dişeridînin. Di pey ra, ji tûmê rûvêsê nêrik (rûvês) tê kişandin. Dest jê ra mahne ye, çawa digihîjê bi xwe, xwe ji tûmî berdide. Wekî mûzê tê qeşartin û bi xavîtî tê xwarin. Tama wê miz e, lê car heye yê tehl jî di navê da derdikevin. Yê ku rengê wan sore ne, tehl in. Bêhneka pir sivik wekî bêhna hêşînayîyê jê tê. Rûvêsên ji derdora malan dûr; ciwan, extîyar her kes li gorî qiweta xwe diçe berhev dike û tîne. Bi gelemperî ciwan diçin berhevkirina rûvêsê, yê extîyar nikarin bi seetan di rê da herin, bi kêş rapelîkin û hilgîrin bînin.

Rûvêsa ku ji hêla şênîyan ve tê çînin, hem tê xwarin û hem jî tê firotin. Li herêmê tu kes vê fêkîya xweş û miz qelandî yan jî kelandî naxwe, bes bi xavîtî tê xwarin. Van demên dawîn gundîyên ku rûvêsê berhev dikin, elimîne koka wê derdixin, diqeşêrin û hişk dikin. Piştî hişkirinê, li gor pêdivîyê tê kelandin û ava wê tê vexwarin. Sê çar parçe kokên hişkkirî di nava surahîyek avê da bi qasî deh deqîqeyan tê kelandin û sarkirin. Piştî ku reng û tama xwe dide avê, wekî çaya demgirtî tê vexwarin. Hin kes jê, ne ji bo şîfayê, lê ji bo ku ji tama wê hez dikin û kêfê jê digrin vedixwin.

Kîloya wê li alîyê Serhedê kêm zêde li dora 20-30 lîreyî ye. Li gorî dirêjî û stûrîya wan, her 5-6 heb rûvês kîloyekê diavêje. Tenê mehekê be jî, hin şênî debara xwe bi firotina rûvêsê dikin. Car heye li dor 500, 600 kîlo rûvêsê diçinin, bar dikin, dişînin alîyê Stenbolê û wan bajarên rojavayî, ji bo firotinê. Yê ku nas dikin pê dizanin, distînin, dixwin. Ku kes hebe pê dakeve û bikare berhev bike pereyekî xweş jê tê.

Ji me gotin, li we peydakirin û xwarin, ji bo siheta canê we.

⁸ <https://tr.wikipedia.org/wiki/1%C5%9Fg%C4%B1n>





Serpêhatîya Celal Ûçarî, ji devê wî:

Demekê ez nexweş bûm, rojekê ji nişka va ketim. Li Bismilê çûm nexweşxanê û filmê kezaba mi kişandin, dema çûm ba doxtor li filîm nihêrt, li mi nihêrt, go:

“Ev tu yî?”

Ku wisa go mi jî şupe kir, mi jî xwe da kêleka wî, li ekranê nihêrt, aqcîger¹ komir e, tev reş e. Go:

“Wele koa ye, te li xwe pir giran kirîye, li gor filîm ya divê tu di qomayê da bûna yan jî tu di gorê de bûna.”

Mi go:

“Wele ez bi lingê xwe hatime o tişkî wisa tune.”

Go:

“Wele wisa.”

Serê sibê mi go ez diçim Dîyarbekir. Ez çûm nexweşxaneyek taybet. Ew dahîliyecî navê wî çi ye, wele profesur e, hevkî meşûr e. Wî yê din rapor mi ra çêkir evê Bismil, rapor çêkir,

¹ aqcîger: pişik.

hevû deh çeşit îlaç, go:

“Van îlaca bixwe, de heta bîst royî tu mirî mirî, tu mayî bîst ro bi şû da were kontrolê.”

Wî raporî hilanî ez çûm, îlaç nestend. Şeveqê hatim Dîyarbekir mi filîm kişand, ew jî go: “Koa ye, go wele duruma te nexweş e.”

Ew jî reçeteka xwe çêkir tijî kir, ez ji wê dê derbaşî fakultê bûm, eynî royî da. Ez çûm fakulte, ba dixtorekî. Mi şiyand filîm. Filîm hat, li filîm nêrt go:

“Wele îşê te nexweş e. Go aqcîgera te mahf biye. Ez ê sê çeşit îlaca bidim te, here bîst roya vana bixwe o were ez ê binêrim bê ka çawa baş dibî, çawa baş nabî.”

O wele ez çûm eczanê mi her sê pakêt hevê wî sitend. Ez çûm malê, êvarê tîlefonî gund kir. Texmîn dikim buhar bû jî. Nîsan bû. De neyse me xeberda, mi go:

“Acîl ji mi ra binê kapê rûvêsê lazim e.”

Go:

“Xêr e?”

Mi go:

“Wele doxtora gotine tu dimrî. Ecele ke, zû.”

Wele du ro derbas bû sê ro derbas bû nizam kî hat, yekî anî. Wele me sipî kir, me hûr kir. Me hinkî keland petkî kolayê tijî kir. Mi dev jî heva berda o wele mi dest bi ava xwe kir. Êvarê çaxa radizêm dixwim, şevqê radivim xurînê şûşekî. Wele heşt deh ro derbas bû, bêhna mi derket, wele ez çêbûm. Bîst royê mi qedîya ez çûm Bismil, mi filîm kişand, li filîmê kevn nihêrt, go:

“Te çi xwar tu baş bûyî?”

Mi go:

“Îlaca te da mi”

Go:

“Jixwe raporlî yî here dewam ke”

Mi go:

“Temam.”

E hatim çûm ba wîyê nexweşxaneyê taybet.

Go:

“Tu hatî?”

Mi go:

“E”

O wele ew jî şand filîm, çûm li wê jî filîmkî kişand, hatim ba wî. Ew jî go:

“Wele baş bûye, lê hîna piçkî maye. Go, tam paqij nebûye. Go tu çi dixwî?”

Mi go:

“Îlacê te daye mi.”

Ê go:

“Temam. Kîngê qedîya, tu van îlaca yazî ke, dewam ke.”

Mi go:

“Temam.”

E çûm ba doxtorê fakulneyê, eynî wê rojê, mi şiyand filîm, mi filîm kişand ez hatim balê,



filîm nihêrt go:

“Te çi kir ewha sax bûyî?”

Mi go:

“Tişkî nekir, îlacê te daye mi, mi xwar.”

Go:

“Na. Virda wêda tune. Go îlacê mi daye te ewhakî bîst roya da paqijî çênake. Go, ez îlac nadim te. Go, here te çi xwarîye deh pazde royên din jî dewam ke go tişkî te namîne.”
O wele ez çûm, ne de² royên din jî xwar û qedîya çû.

Amadekar: Ayela Zarto

Zarbêj û palpiştên xebatê:

Celal Êçar: 65-Xwende-

Gundê Eskarê/Pasûr/Dîyarbekir

Fatma Yerlîkaya: 64-Nexwende-

Gundê Tîyaxsê/Pasûr/Dîyarbekir

Dîroka hevpeyvînê: 23.02.2021

² ne de: neh deh.



Elîf Gunduz

Sêkanîya, mezrayeka Tahê Sêvînê ye. Tahê Sêvîn jî gundekî Pasûrêyê ye. Ev kesên ku di kilamê da derbas dibin hin kes etmankî ne û hin kes jî ji mala aqûvê ne. Etmankî û mala aqûvê eşîret in û ji Pasûrê ne. Ev kilama, serê ewil kê derxistîye yan jî kê gotîye nedîyar e. Paşê li nava gelî belav bûye.

Ay ay wayyy wayyy

Hamê digo de lê xe, Hemîdo ti lê xe, pozberano ti lê xeee

De ti yê qûndaxa guc û modalîyê¹ bigir, bexê li xwarê xe

De ti yê derbekî bide li bejna ‘Ezo,

Şan û şerefekê ji dayîka xwu ra bi dinê xe lawooo ayyy

Sêkanîya mîrat bişewite bi simaq e,

Tivinga destê Hemîdê layê Hamê li ser desta zaqezaq e

Hemê digo Necê lawo îro ji mi ji teee kî bireve jina wî bêtelaq e, were mere o ayyy

Ay were mereee, kesê ku ji mala xwu rave ber bi şerê Hemîdê lawê Hamê here

¹ modalî: tiving e.

Ew bi xêr û silametîyê bi ser mala xwu da venagereee
Sêkanîya mîrat bişewite li hûr devîyaaa²
Gava ku deng bi tivinga Hemîdê Hamê diket, Necê tiving davêt, direvîya
Hamê digo Hemîdo ti yê derbekî lê xe li bejna ‘Ezo serekî keçel û gurîya
Hemîdê Hamê derbekî lê xistîye li bejna ‘Ezo,
Acara³ mêra ji mala Mîrzo diqedîya dayê o ayyy

Digo Sêkanîya mîrat bişewite me bi ce ye
Ne dengê tivingê Hemîdê Hamê li ser kozika bavê Necetê mi şer û qewqe’wû⁴ oxilme⁵ yeee
Saryetê bi sê denga gazî dikir digo Neceto birawo ez ê ketime de bextê namûs û şerefa kekê
xwu ye ayyy

Digo ti yê berê tivingê nedî kozikê jorîn,
Mala Sofî Huseynê apê me ne tişkî me û wan bi xeravî li ber hevûdi tine yeee
Ne ti berê tivingê nede kozikê jêrîn,
Mala Herbîyê Hesên e roja şer û oxilmê giran mêrê pişta te yeee
Le ti berê tivingê bide kozikê ortê,
Mala Mihemedê Mîrzo bi dev dost in bi dil neyar iiii,
Derdê wan ê ne kuştinê mêran e,
Derdê wane’w ji îro pê da ji dora Tahê Sêvîn hevê kar û golika birevînin birawo ayyy

Ay ayyy way way wayyy

Digo Sêkanîyaaa mîrat bişewite serejêr e,
Dew îro pîyê Necê vêç e erdê naqefêleee
Digo hînê bimihîne⁶ mi dî Necet bi sê denga li Xêryayê kir qêrîne,
Digo ti darê dûrebînê⁷ ji mi ra bîne,
Şika Şerê Sêkanîya îro kî û kî nee
Digo Xêrya lez dike dilezîne darê dûrebînê tîne,
Necê dikişîne çavê xwê, digo îro çavê mi ximam girtîye qe navîneee

2 devî: darên biçûk.

3 acar: zirîyet.

4 qewqe’wû: qewqe û. qewqe: qewge, şer.

5 oxilme: şer û pevçûna mezin.

6 hînê bimihîne: bi kel, bi hêrs.

7 dûrebîn: dûrbîn.

Saryete jê distîne dikişîne çavê xwuyê reş ê qelemîn e
Digo mala te xerave, vî şerê hanê yekî jê Wezîrê Lal e
Yekî jê Hemîdê Hamê ye o ev ê dinê Dîlohê Gurî yeee

Digo kî vû kî vû şer herişand,⁸ Dîlohê Gurî şer herişand,
Hemîdê lawê Hamê xencer kişand,
Kiras û derpiyê bavê Xêryayê apê Saryetê di xwînê da diniqîşand wayyy
Digo Rebiyo Xwedê bêkubar î
De'w ev ê fena Hemikê Hamê kotiyê pîsê merezar î,
Derbekî lê xistîye li bejn û bala bavê Xêryayê apê Saryetê mêrê bi sed hezarî wayyy
Le canê bavê Xêryayê apê Saryetê kirye fena peza gura xwarî way wayyy

8 şer herişandin: gurkirina şerî.



Gündê Tahê Sêvînê





Zarbêj Qedrî Gunduz

Berhevkar: Elîf Gunduz
Zarbêj: Qedrî Gunduz
Temen: 53
Perwerde: Nexwende
Herêm: Gündê Tahê Sêvînê/Pasûr/Dîyarbekir
Dîroka berhevkirinê: 17.02.2021

Bersivên xaçepirsa



folklorê







WEŞANÊN WEQFA ÎSMAÎL BEŞÎKÇÎ




Weşandina rêzeya pirtûkên
Erdnîgariya Kurdistanê
berdewam dike.
Piştî pirtûka Erdnîgariya Agirî
niha jî Erdnîgariya Wanê çap bû.



Ji hejmara yekem heta ya dawî; hemû
hejmarên kovara **Kürt Tarihi** êdî
wek E-Kovar amade ne. Yê bixwazin
dikarin ji malpera me, yan jî ji
Google Kitapê bi dest bixin.



Ji bo aboneti û agahiyên berfireh:
www.kurttarihi.org



Belavkarîya Giştî: Emek Kitap

www.ismailbesikcivakfi.org
info@ismailbesikcivakfi.org

IBV

Stenbol tel: 0212 245 81 43 Gsm: 0541 391 81 49
Diyarbekir tel: 0 412 229 33 29

